Cêmis Ciwîs di rexna edebî ya nû de
Vekolînek di romana nûxwaz û zaravê wêjeyî monoloja hindurî de

Beşê 2

Vekolîn: Şakir Nûrî

Wergêr ji erebî bo kurdî: Tehsîn Navişkî

Ciwîs berdewamiyê bi kamilkirina girêdanên hoşê hestdar, di romana xwe ya mezin de Yolîsîs dide. Di romana wênê hunermendî di gencîniyê de, di pişkên yekê û di wê û pêncê de; Ciwîs dest pê dike, ji serpêhatiyên cîhana der ve pêxemet bi navketina cîhana hindurî, ji demê nuke ber bi demê borî. Walter Lîtiz dibêje:

Ciwîs di çerxekî de dijiya, curên hizirkirina lasayî bo civakî arêşeyên bi guman bûyine, dibe wehmî jî bûyine; çunke kêşe dijî vê mijdariyê bûye. Êdî berê Ciwîsî kete semta formên korane yên ziman jê pêk dihat. Nehinêre! Demê pîtey didene hunerê wî, ji xelkê Diblinê; heya şevbêriya fenîgan, Dê bibînin peyv di dirovên xwe de ji çevengan û peywendiyên der ve yên rastiyê bi tê nahêne barkirin; ya durist, dibine yekên dînamîkî û ji rastiyê ra nêrîneka nû dafirînin (21) .

Bi rêka teknîka monoloja hindurî; Ciwîs şiyaye yaxîbûna Dîdalyosî dijî rêkên yasayî yên hizirkirinê di civakê xwe de berçav bike. Herwesa wênê hişkbîriya hizirî ya di îdalyosî, ji qonaxa zarokîniyê; heya qonaxa gehiştina laşî, em dişên bibêjin, romana wînê hunermendî di gencîniyê de, romaneka li ser jiyannama wî ye; belê cudaye ji romanên din yên li serjiyannamê hatiyne nivîsin di wêjê niglstanî û wêjê cîhanî de; çunke Ciwîs serpêhatiya xwe di kete serpêhatiya hunermendê dahêner. Mark Şor dibêje:

Romana "wênê hunermendî di gencîniyê de"; mîna herdu romanên

cîhanî Tunobnkî û kuran û aşiqan ku wek romaneka otobiyografiye. Belê ji layenên din ve berovajî van romanan dihê; çunke kerestê xwe bi rengekê hûr sînor dide û biha û sîmayên serpêhatiya xwe şirove dike, ne bi axivtinên zêde û ne saloxetên mînevî; ya durist, bi rêka avakirina şêwazî, derbirînê ji wê çendê dike.

Hizra wênê hunermendî di lawîniya wî de ew havîbûna hunermendê gence di çarçovê xwe de. Ev havîbûne dipeqe û guhorankariyê dike, bi sê rêk û forman; qaremanê romanê dihê veguhaztin di hersê qonaxên jiyê xwe de, savayniyê-zarokîniyê-Baliq bûnê. Di binaxê xwe de havîbûna Dîdaliyosî anku mandelkirina çarçovê mirovîniyê; anku berzekirin. Di romana Yolîsîs de, çaxê Ciwîs afirandinê di hoşê mirovî de dike; anku afirandinê di hoşê me de dike.(22).

Bi rêka vederiyê, Ciwîs dizivire jiyana qonaxa savayniyê û bîreweriyên, digel dayik û babên xwe borandîn. Bizavê dike peywendiyên dayikê bi biçûkî ve bizivirîne; ji ber ku savayniya wî li jêr sulta babê bûye. Wênê dayikê di evîna wê ya pak jê re dibîne.

Ciwîs tiyora xwe ya ciwankariyê bi rêka qaremanê wênê hunermendî di lawîniya wî de Stîvin di îdalyos berçav dike; hindek zêdeyên kesokî, li ser tiyorên rexneyî yên Eristoyî û Elekwînî zêde dike; demê giringyê di dete formên wêjeyî yên Hemereng û peywendiyên hunermendî bi kerestê wî ve.

Çi pê nevêt filobîrî gelek harîkariya pêkhînana tiyorên Ciwîsî yên ciwankariyê kiriye. Ciwîs wesa dibîne Stîvin qaremanekê otobiyografiye, serkeftinê li ser çarçovê xwe û xêzanê xwe û kinîşta xwe dihîne; pêxemet bi ser pênasa xwe hel

bibe. Stîvin giringiyê dide tiyora Sinit Toma Elekyonî û dibe yek ji bawerdarên wî û elementê pêkhatina ciwaniyê ji wî werdigire. Ciwaniya felsefa Toma Elekyonî ev elemente: Seranserî, hevkarî û geşbûnin.
Dê bibînin romanên Ciwîsî yekên Kamlin ji tektîkê û mijarê û destpêka ciwaniyê. Demê Ciwîs xwe ji hebûnê dûr dike; ew xwe bi nav cîhana hindurî ya kesokiyên xwe de berdide û nexweşiyên mirovî yên herûherî diyar dike. Roman pêkhatiyê guhorîna hoşê huneriye; her ji biçûkatî; heya derbederiya xweyî; demê dibe azadî û afirandin. Qaremanê romanê çaxê dibe helbestvan; hîngê ji ser dînê dayik û Baban diçe ser dînê hunerî yê peywendiyên Yorîtatîl li bajêrê Diblinê. Ciwîsî bawerî bi wê çendê hebûye ku huner bi tinê behaneye bo havîbûna mirovî. Sererayî ku Ciwîsî hizra tiyora xwe ya ciwankarî ji Toma Elekyonî wergirtiye; lê wî tiyoreka xweser ji xwe re afirandiye; mîna rexnegir Podkîn dibêje:
Ciwîsî tiyora xwe ya ciwankarî bi xwe afirandiye; geleka bi zehmete em tê bihînîne derê, ser bi çi xwandingehên wêjeyî ve heye.(23)
Bi rêka qaremanê romanê, Stîvinî dê formên wêjeyî û tiyorî yên Ciwîsî niyasîn: Ku stirankî, dastankî û diramîne. Her wesa ronahiyê dêxe ser peywendiya hunermendî bi kerestê wî yê xav ve û siroştê hunerê ciwaniyê.

3 -zîndîkirina Homêrosî ji layê Ciwîsî ve:
Cîhana Yolîsîsî ya dastanî:
çend Yolîsîs xwe bi bûrî yê dastanî pişgerm dike; ew nêzîkî odîse û hamltî dibe. Ciwîsî di herdu şakarên xwe yên wêjeyî de qazanc ji van herduwan wergirtiye; bêy şêwazê xwe yê taybet û taybetmendiya xwe ji dest bide; herdu dahêneran hêzeka zêdetir daye "Ciwîsî "romannivîs. Rîtşard Elin

Hişyarî li cem Ciwîsî berper 9 jiyê dîrokî, edebî û fermesoniyê, li navbera Homêrosî û Ciwîsî, nêzîkî hizar salane. Yolîsîs dastana nû ya çerxê me, bûye mîratxwara dîroka mirovî hemûyê. Wekhevî li navbera herdu karên çandî, bi tinê wekheviyeka çevengane ye. Sebaret vê boçûnê rexnegir Rîdşard dibêje: ji ber çi Ciwîsî jêderên girîkî yên kevnar yên herduwan Stîvin Dîdaliyosî û Liyo Bilomî * ser ji nû ava dike? Bi rastî eve ji mijarekê wêjeyî pitirê vedigire. Wekî hemû torevanan, Ciwîsî viyaye, dîroka bûryê komî bizivirîne, zêdebarî gava kesokî ya tê de dijî (24) .
Homêros serpêhatiyeka mirovînî ya heçko heyî, berf

têwerandineka mixamire qaremanane ya hejî biriye; di çaxekê wesa de, Ciwîsî hemû pêkolkirîne, pêxemet afirandina seqayekî ji elementên destpêkî yên durist; heya dûrtirîn sînor. Ciwîsî bi şakarê xwe, cîhaneka bê sînor ya dastana nû pêşkêşî me kiriye.

Ciwîsî her di jiyê diwazde salyê de hizir di nivîsîna romana Yolîsîs de kiriye; çaxê li ser kursîka xwandingehê, têwerandinên wî yên çarlis lambî nivîsîn dixwandin. Her hîngê wî li bajêrê Zyorx gotibû hevalekê xwe, ew gelekê daxbare bi Yolîsîsî. Ew hevalê wî yê bi navê Curc Boş ji kîs devê wî dibêje: hêşta jiyê min di yazde sal bûn, demê me serederî; digel cenga tirwade dikir. Lê dul bi tinê mane di bîrdanka min de. Pêdiviye ezê rastgo bim, di jiyê diwazdê de. Min hez sofiyatiya Yolîsîsî kiriye. Demê min koma Diblînê nivîsî, min viya navekî bo koma Yolîsîs li Diblinê helbijêrim; belê her zû min ew hizir hêla. Li bajêrê Roma; çaxê min nîveka romana wênê hunermendî di gencîniya wî de nivîsî; her hîngê min zanî Yolîsîs dê tivavkera karî min yê wêjeyî be; ji ber hindê min dest bi nivîsîna "Yolîsîs "kir 25 .

Pêkhatiyê Yolîsîs bi hêviya Odîsa homîrîve hatiye nivîsîn. Ciwîsî wesa daye, di her bûyereka Odîse de, dibe şiyanên bi kar hînanekê hebin. Wî bi kiryar selimand, girêka homîrî di şiyan de ye, bi zimanekê hevçerx bihête afirandin; wek binaxe bo karên çevengane yên dûrtirê bi kar bihînin. Di romanê de du kesokiyên serekî hene. Yek Liyobold Bilome, karê rojnamevaniyê dike. Yê duwê Stîvin Dîdaliyose, zelamekê xwedan rewşenbîriyeka bilinde. Hemû rûdanên romanê dikevne roja yekşembî, rêkevtî 16/ xizîrana sala 1916 zayinî de.

Resenê Yolîsîsî; wekî berî nuke hatiye diyarkirin, ya di serpêhatiyên Ciwîsî yên yekê de. Guhorankariya romanê anku guhorankariya dahênana hunerî di jiyê çilê de. Avakirina romana Yolîsîs ji

rûdanên dastanî yên wergirtîn ji Odîse pêk hatiye. Ev rûdane jî dibine sê pişkên serekî yên li ser sê yekan parvekirî. Her yekek ji van yekan, ji yê din yê cudaye; ne bi tinê bi kerestê xwe; belkî bi şêwaz û teknîkên xwe jî. Rexnegir Stiyort Gilbirt dibêje: du fakter hene wesa kar li "Ciwîsî "kiriye ku ji hemû karên yên li pêşiya wî serkeftîtir bin; heya li navbera nivîserên ji hemûyan riyalistîtire: Yê yekê nêrîna wî ya ne asayî bo kesokiyên wî. Ya duwê: Bi karhînana wî şêwazê monoloja bê deng, ne wek şirovekerê kardaneveyên derûnî yên hindurî bi tinê; belê di vegêrana rûdanê de (26) .
Ciwîs dikariye derbirînê ji hemû hûriyên layenên jiyarê û dîroka seranserî ya mirovî bike, di mawê yek rojê de, li bajêrê Diblinê; ji ber hindê dê bibînin nivîser der vey kesokiyên xwe, li ser hemû rûdanan yê zale. Heger em dûvçûna guhorankariya Yolîsîsî bi rêka peywendiyên wî bi wênê hunermendî di lawîniyê de bikin, dê bibînin xem û aloziyên Stîvinî ewin bibe hunermend. Ciwîsî baweriya bi wê çendê heye ku derbederî yek ji elementên dahênana huneriye. Kesokiya Stîvinî di romana wênê hunermendî di gencîniyê de; ew e kesokiya pişterêbûy, ewê afirandina cîhanê bi peyvan dizivirîne. Dîsa di Yolîsîsî de, ew helbestvanê pişterêbûyê derbedere, yê ku hember nexweşî û astengan ne çemyêt.
Teknîka nivîsînê û dîtina saykolojî

Ciwîsî hevterîbiyek di pêşxistina kesokiyên xwe de; di gel kesokiyên Odîse de çêkiriye. Li pey vê çêkirinê; dê bibînin kesokiya Bilom wek kesokiyeka Yolîsîsê hevçerx pêkolê dike, pêxemet afirand na bûyerên bîst salan ji wexera Homêrosî di mawê rojekê de. Anku Homêrosî bo romana xwe bikete binaxe. Ciwîsî pêkol kiriye, derbirînê ji giştî jê bike bi rêka taybet. Hindî ku Mistir Bilom û Misiz Bilom û Stîvan dibine kesokiyên nû, bo nimûnên destpêkî. Dê bibîne, bandora Odîse, ya li ser aşopa Ciwîsî zale. Vê bandorê wel Ciwîsî kiriye, ser ji nû girêka homîrî bi zimanekê hevçerx bi afirîne û bikete bingehê kiryarên çevengî. Di heman demî de, bi rêka xwe yan rêka hindekên dî, xwe bi dirîjiya jiyana riyalistî ya bajêrê Diblinê pişgerm kiriye. Belê zehmeta Yolîsîsî ya nepeniye di hemerengiya mîtodan re û şêwazên Ciwîsî bi kar hînayin ji bo amadekirina gelek mijaran. Sebaret vê çendê, rexnegir Wiliyem Yorik Tindal dibêje: Ciwîsî navigînên baş ji giringî û merema xwera dîtin; sererayî hindê, wî diviya ku ji wê pitirê bêje. Ew pêdivî gelek şêwazan bû û zehmet bi di eina wananive dibir. Her hejde werzên wî, hejde arîşe diyarikiriyne û di her werzekî de teknîkeka cuda ji ya din bi kar

hînaye ku ya guncay be; li gel mijarê, werzî û teknîk jî ji mijarê nahête cudakirin. Heya Ciwîs mijarên xwe pêşkêş bike, şêwazên hemecûr bi kar hînane; mîna monoloja hindurî, pirsiyar û bersiv, hevbêjiya diramatîkî, çavlêkirineka veçixandiye (27) .

Ciwîs di hemû karên xwe de, heman serborê çare dike; lê bi hemerengkirina şêwazên nû. Monoloja hindurî, teknîka zala yekaneye li ser romana Yolsîs û çi nivîseran, hoşiya mirovî bi vî şêwazî berî Ciwîsî wêne nekiriye. Bi rêka teknîkê, nivîserî viyaye dakokiyê li ser girêntiyên kesokiyên xwe di dîroka mîtolojiyan de û çalakiyên din yên eqlî bike. Rexnegir Dîvîd Dîgis, vê çendê misoger dike: Yolîsîs li ser sê astên serekî nivîsiye: Riyalistî, Homêrosî û sofî. Merem ji teknîkê ew e ku layenê gerdûnê ji çîrokê misoger bike (28) ..

Çarçovê Diblinê û Bilomî û Stîvinî, cîhaneka taybete. Lê wana fireheyî di gerdûnê de kiriye, bi rêka hevbendiya wan bi çîroka Yolîsîsîve; wekî Homêros di Odîsê de, ji layekî divegêre. Ji layekê din, hevbend ya wan bi palderên sofiyatiyê yên hemecûrên veşartî ve di mêjkê mirovî de. Dîgis pêve diçe û dibêje: hindî teknîka monoloja hinduriye; wesa bi sanahî nabe rêk yan mîtod ji bo salûxdana doxên hoşî çunke ev rêke ji teknîka vegêranê û wênekirina kesokiyan pêk hatiye. Heger em pirsiyarê arestey xwe bikin; sebaret şiyana Ciwîsî bi girêdana gelek rûdanan; ne bi tinê rûdanên rojekê; heya qaremanê xwe diafirand; dibe kesokiya bazneyî ya pitirê kamle di romana cîhanî de. Bersiv ya di Migirtiyan de: Migirtî jî yên di şirovekirina vegêranê de û her wesa di şirovekirina saykolojî de. Rêka nuwe di saloxed kirina pesnên helwêstên eqlî de (29) .

Di Yolîsîs de mirov di be cîhan bi rêka hukarên derbirînê. Têwerandên kesokiya Bilomî pêkihatiye ji têwerandinên mirovî di çêwekî verêjdarda. Li wî çaxê bi van têwerandina radibe, li wêrahenê hindek rûdanên din hene Ciwîs vedigêre.

Pêdiviye amaje bi kartêkirina bizava şirovekirina derûnî bi serokatiya Yongî di cengê de, li ser hizra Ciwîsî bihête danê. Sererayî ku Ciwîs daxibar nebibû bi ferimesonyê; belê pa semta Birigsonî û waythêd wyên din, heman rêka hizirikirinê wergirtibû. Zêdebarî hemûyê Ciwîs bi karê montajê sînemayê û şêwazê têgehiştina bi dîtina xwe antbay di şêwekarî de û hizirikirina rehayî di saykolojî de û rêça zêndiyane di ferimesonê de daxbarbûye.

Ciwîs kariye dastanekê di rojekê de bafirîne û jiyara hindurî û der ve

ya kesokiyên xwe tomariket. Bi vê çendê yekên lasayî yên romanê pelixandin û hemû astên hişyariya mirovî amade kirin. Ji layekê din, wî rêkên lasayî yên nasand na cîhanê pelixandîne û ber bi romanên nû çûye di serborê û lêgeriyana rastiyê de. Ji ber hindê, em di vekirina mijarên serekî yên wan nagehîn. Avakirina bûyeran dimîne li ser yên berî wê û yên piştî hîngê dihên. Sebaret vê çendê, rexnegir Edmon Wilson dibêje: bi rastî em tênagehîn çi diqewime; heya em ji nivîsînê bi dawî nehên (30) .

Sererayî ku Yolîsîs xwe bi Odîse piştgermkiriye; belê pa ew ji hindê dûrtirê diçe. Romana wî bo me hemû zanîna mirovînyê dihîne berçav; demê Ciwîs bo me kûratiya qaremanên xwe Bilom, Molî û Stîvinî aşkera dike; bi wê çendê kûratiya mejiyên di rehndên wê yên deronî de aşkera dike. Jibû vê çendê, Ciwîsî bo her kesokiyeka xwe teknîkeka taybet bi kar hînaye.

Dê bibînin, Ciwîsî şêwazê monoloja bê axivtin bi kar hînaye ku di biniyatê xwe de, teknîkek bûye Şikispîrî di Hamlit de bi kar hînaye. Stîvin wê bi rêka şirê berovaj dike; belê Bilom derbirînê bi pexşanê jê dike. Her wesa mêjkê Stîvinî bi rêka çevengan kardike. Li cem Bilomî Dê bibînin mijarên çevengî di monolojê de hene; mîna hestên wî yên romantîkî, berf rojihelatî û mirina kurê wî û hindek tiştên din diçin. Hindî ku bûn, sêkis û mirin in, di mejiyê Bilomî de di têkelin. Beramber Stîvin; wek kesokiyeka rewşenbîr xûya dibe. Belê Bilom mêrekê xerîzane ye. Peywendiyên Stîvinî bi Bilomî pêşdikevin. Dê bibînin Stîvin di Bilomî de bavê ruhiye; beramber Bilom î di Stîvinî da kurê wî yê berzeye. Terzê kiryarên Bilomî di heçko heyîne. Spêdê ji mal diçe, paşî bi şevê dihête ve. Bi duristî roja wî wek; wexerekê lêdihêt.

Hindî ku Ciwîse efsana Homîrî navegêre; ya dirust bo romana xwe bi kar dihîne; heya hezeka seranserî bide kesokiyên xwe, Ciwîsî sûd ji Homêrosî kiriye. Hizir di mejiyên kesokiyên serekî re derbaz dibin û heman hizir bi şêwekê boş radibine ve. Dîtina pirteqalê bi tinê bo nimûne, di hoşê Bilomî de wexerekê bo nav baxçekê pirteqalên rojhelat amade dike û bîra wî li hevjîna wî dihîne ya ku rehên wê zivirine bakrawendê derya spî ya navîn; ji ber hindê bîra wî bi nihênana wî ya zû û cudabûna wî ji hevjîna wî dihîne.

Bilom û Stîvin di civakî de di retkirîne; belê ageh ji vederî û havîbûna xwe heye. Her yekî dive di yê din de qurtal bibe. Hemû kiryarên Stîvinî, wesa lê dike dijî civakê xwe be, di birca Martîlo de bi vê hevdijiyê dihese; heya lêdana wî ji layê serbazên ingilistanê ve. Lê Bilom, di bîrhatin û xewnan de dijî.

Ciwîsî demê wê gavê bi kar hînaye; ji ber hindê dê bibînin, cih wekî wêney diborin. Zanîna her rûdanekê ji Yolîsîsî, ya giringe pêxemet têgehiştina romanê; çunke Ciwîsî roman ji terzê laşê mirovî ava kiriye; wek çevengê pêkhatiyê Yolîsîsî. Her rûdanek; anku dîmenek ji demekê destnîşankiriyê rojê û girêday endamekî ji laşê miroviye. Her wesa çeveng û teknîkên xwe yên taybetî hene. Her rûdanek hevterîbiya kesokiyekê yan mijarekêye di Odîse de. Bi tinê bo nimûne, dê yekemîn bûyeran berçav bikin. Yolîsîs bi xwe ji hejde bûyeran pêk dihêt. Vêca de nakokiyê ji hev bivavêrîn; ha wesa hemereng didene dûvêk di yekên din yên romanê de, ji layê dîmen, çax, huner, çeveng û teknîkan ve.

Derencam

Pitiriya rexnegiran wesa dibînin, awayê nivîskî li cem Ciwîsî yê bi zehmete bo xwandinê û têgehiştinê. Sedem jî dizivire wê çendê;



Ciwîsî gelek tiştan re dide, beramber gelek şêwaz jî didîtin, pê li ser ewê dîtî dipeyvî. Karên Ciwîsî; digel pêşkeftina hişyariya wî pêşve diçin. Dê bibînin, ji sakariya rêjeyî di xelkê Diblinê de û wênê hunermendî di gencîniyê de, xwe divegûhêze şêwazê bi zehmet di Yolîsîs û şevbêriya fenîganê de. Li vê derê wek Şkispîrî xuya dike, ji layê zalbûna wî li ser zimanî û qesa di karê xwe yê wêjeyî de didarêje.

Ew demê rastiyê pêşkêşî me dike; hîngê hişiyariya me, bo vê gerdûnê berfirehetirê lêdike. Mijarê serekî li cem Ciwîsî, mirove li bajêrê Diblin ê; paşî di be mirovê hemû cihan li hemû

çerxan. Ji ber hindê em di şêyin bibêjin: Ciwîsî bi tinê pirtûkeka nivîsî. Eve piştî hemû şiyanên xwe terxankirîn û hemû jiyana xwe mezaxtî; digel xelkê Diblînê ewê giyanekê cîhanî diromana wî de wergirtî.
Ji têdîtina, têkrasbûna teknîk û kesokiyan di romanên wî de. Kesokiyên Stîvinî û Dîdaliyosî; wek nimûne, dihîne veguhaztin di romana wênê hunermendî di lawîniyê de bo Yolîsîsî; ji ber gelek sedeman, Ciwîsis di dawiya jiyê xwe de rawesitiya û b serborên xwe yên nû di aşopa xwe ya hunerî de hêlan.
Her wesa romanên wî wênê hunermendî di gencîniyê de û Yolîsîs, çi pênevêt nêrîneka nuwe bo wê cîhana di xelkê "Diblin "ê de saloxday. Ciwîsê xwedan serbor çare dike; belî bi hemecûrkirina roxisar û gewherane. Heger romana wênê hunermendî di lawîniyê de, wênê geşibûn û serkeftinê be; beramber Yolîsîsê wênê şkestin û daketinê di deteme. Demê em kesokiyên Bilomî û Stîvinî bi vexûnîn, dê bo me aşkerabe, hemû pêkahatiyekê ber çavên mirovê hevçerxe û dûratiyeka berze tê de heye; ew jî dûratiya giyaniye; her eve ye, derbirînê ji bi tinê yatyê û vederiyê û havîbûnê û boşayê dike. Ewên kesokiyên Ciwîsî ji ber dinalin û li ramanê rastiyê digerin.
Tiştê giringê Ciwîsî di hunerê romanê de bi destivehînay ew e, xwandevan hişiyarikiriye û xurtî lêkiriye, beşdaryê tê de bike. Ji ber hindê Dê bibînin, piraniya rûdanan dikevne di mejiyên kesokiyan de, kêmek jê dikeve di riyalista di îdeyan de.
Ciwîsî sê nimûneyên qaremanan dayine me: Qareman di wênê hunermendê di gencîniyê de nivîser bi xwe ye. Qaremanê şevbêriya fenîganê civakê mirovîniyê ye. Qaremanê Yolîsîs mirovekê normale. Derbirîna Ciwîsî çaxê borî, di serhatiya komî de dirust dibe. Ji ber hindê; Dê bibînin kesokiyên wî tevlîhev di bin; heçeko em di Stîvinî nagehîn di Yolîsîs de; heger em çi ji bakrawendê kesokiyên din nezanîn di wênê hunermendî di lawîniyê de. Peywendiya Stîvinî digel Bilomî, ramana xwe heye; bi sedemê vederiya Stîvinî û retkirina wî ji layê babê ve di wênê hunermendî di gencîniyê de. Sebaret Yolîsîsî pêşveçûna Ciwîsî ji stiranê bo dastanê sînor dide û Ciwîsî ji xwedî ber bi mirovê heçkuheyî dibe, paşî ber bi mirovîniyê ku tirsnaktirîn girftariya civakê rojavayî tuş bûyê çare dike, ew jî giriftariya havîbûnêye.